# DENGÊ KURD

24 gelawêj 2713 k 15-9-2013 z DENGê KURD -hjmar (16) www. Pdksp.com


# çavsorî û Serkutkarî Jibal (Pyd)ve Berdewamin

## Derewkarî... derewçînî

Derew kirêtkariye ….. karekî ko rastiyê berovajî jîwar û rewşa lidar dike , reng û ronakiya jiyanê di şerpizîne , digorîne , vedimrîne .Derew dema ko destkarî têde şax û poxên dilîze û dirêse û vedirêse wê gavê derewçînî lidar dikeve .Îro roj li gorepana siyasî ya kurdî derew û derewkarî û derewçînî zor û bilavin li yek şîp û şepêla xwe li ast û rastê qoşkirinê .Derewkariyên (pyd) di şekendên ragehandinê de serdest û serbestin dijî serokatiya kurdistanê sebaret bi gongireya kurdewariyê ve .(pyd) astengiyên derewkariyê peyda dike da ko kongireya kurdewariyê lidar nekeve di rêya tomet û dengpêxistinên rûşûştî û bi şêwazekî zikreşî ta digihêje radeya rûreşiyê û xiniskariyê .Dema ko derewkarî bibitin siyaset wê gavê rengê jiyanê payîzê hildibijêre û li xwe dike



# ÇIMA GIRÊDANA KONGIRA NETEWÎ DI VÊ DEMÊ DE?


2 « Dayika kurd Sînemxan

2 « Nivîsîn û zimanê zikmakî

3 « Di bîranîna serjimara awerte de 22-8- 1962

# Dayika kurd Sînemxan

Mihemed Ebdê



sinemxan

Berî hertiştî em tev nas dikin malbata Bedirxaniyan kî ne..? Lê dîsan em ê li ser vê malbata resen bi kurtî b'axivin.
Gelo kî heye mîrekên herêma Botanê nasnakin mîrîtiya Botanê ku 1821'an de di serdema 19 an de, hatî damezrandin bi serpiriştiya Mîr Bedirxan paşayê Ezîzî di kurdistana bakûr de .
Lê ji bilî karê wan ên wek dewlet, bi des karê şoreşa ronakbîriyê kirin. Mîr Miqdad Midhet Bedirxan, bavê rojnamegeriya kurdî ye, ew î (Rojnameya Kurdistan) di sala 1898'an afirand û li (Qahîrayê) paytexta Misrê da çapkirin, û mihane li herêmên kurdan dihat gerandin..
Mîr Celadet Alî Bedirxan afrênerê "alfbeya" kurdî ye, û bûye dûyem kes ji malbata Bedirxaniyan ku netenê rojnama afirandine, lê ji kurdan re alfeba çêkirî ye. Û di sala 1932' an de nixurîya xwe (Hawar) çap kir, û di nav rûpelên wê de alfeba kurdî ji xwendivanê kurd re weşand. Celadet bê Bedirxaniyan nikarî bi tena xwe vî karê mezin rahêjê, yekser alîkarên wî birayê wî Kamuran Bedirxan û xanima wî Rewşen Bedirxan. Destê Mîr Celadet girtin ta ku wî çend kovar û rojnameyên dî jî afirandin. Dayê Sinemxan dergehê mala wê vekirîye mîna dergehê kelha bavpîrê wê Bedirxan paşa. Dayê Sînemxan niha li Hewlêrê rûniştiye, mala wê bûya heca hezker , evîdarê dîrok , çand û rojnamegeriya kurdî, çimkû ew e dûnda pênûs û rûpelên dîrok û rojnamegrî yê.
Ji bilî Sînemxan wek keça Bedirxaniyan, min xwest ez Sînemxan a mirov bi we bidim nasîn.

**Dayê Sînemxan dema te xweş be û xwedê temenê te mezin bike, û her sax û saxlem** bimîn e..
"Ser çavan kurê min"

**Dayê di vê qunaxê de çi proje û pilanên we yên mirovatî hen e?**
Projeya min ya herî giring niha kurdên me yên rojava ne, ez û malbata xwe! pilana me ew e ku em alîkariyê bi wan re bikin. Birastê dilê min xemgîn e, ji ber ku rewşa welatê Sûriyê hestiyar e, û nexasim kurdên me û herema kurdî, min sê serdan dane kampa Domîz, cara yekem min alîkarî bixwe re bir, û min divê serdanê dixwest ku ez baş zanibim ka rewşa wan çiye? Cara dûyem min dîsan alîkarî bir, min ji zarokekî pirsê tu çi dixwazî, ji min re got:" Ez petatokên zarokan dixwazim" Vêce dilê min êşand, cara sêyem min û zarokên xwe û hin heval jî, me dîsan alîkarî bir, û min petatokên zarokan jî jibîr nekir.

**Dayê tu bixwe van karan dikî ji bo alîkariya kurdên rojava?**
Ez ê ji bo te bêjim, berî çend salan çend keçên me ji Kurdistana bakur, hatin herêma kurdistanê ji bo xwendina navxwe yî bixwînin, vêce min gelek guhdan da wan keçan, hat bîra min ku ez ji wan re tiştekî bikim, bi tena xwe min nikarî vê alîkariyê pêşkêş kim. Mala min cihê mihvan , ronakbîr û siyasetmedarên kurd ji her çar parçên Kurdistanê ye, û tev jî dibêjin min yadê, sed yadê ji devê wan derdike ve, min jî ji mihvanê xwe re digot, alîkariya wan keçikan pêwîst e, min hin merc dabûn ber mihvanên xwe, ên ku di civata min de, ji bilî kurdî b'axive, wî cizayî wî pere bin, û min gelek pere dan hev, çimkû bê hemdî xwe gotinin Erebî, Turkî, Farisî, d'axivîn. Ji wan Xwedê jê razî Şerefedîn Alçî, ew jî gelek caran dibû mihvanê min, ji min re digot: "Ezbenî va ez dikim herim ji te re 500 Dolar cizayê min ji ber ku ez gelekî bi Turkî di civatata de b'axivîm" Xwedê wî bi dilovaniya xwe şake, kurdekî welathez bû.

**Dayê projeyek ku hun saziyek xêrxwazî vekin tune ye?**
Ev karê ku ez dikim karekî kesayetî ye, birastî ez pir ji pirobuganda hezna kim, min da ye pêşiya xwe ku ez alîkara wan keçên xwendevan bim, û paşê kirîza Sûriyê jî daket meydanê, min yekser berê xwe da wan jî, li gor ez dikaribim bidim û bikim, min hîn jî tiştek wesa mezin nekirî ye, Lê ji bo xwendinê û nexasim keça kurd amade me ku her alîkariyê bidim, çimkû daxaze bavê min celadet e, û daiyka min Rewşen e..!

**Dayê di serdana te ya kampa Domîz hewe çi ji wê kampê naskir.?**
Belê min gote te ez sêcaran çûme kampa Domîz, di serdan yekem de min her tişt naskir, çima koçber bûne sedemên koçberîyê çibûn, lê ya herî ku di mitala wê de me xwendin û dibistan, min hewl da ku ez wan hînî vê bikim, pêwîste ku dibistan vebin, mamoste çêbin, li gor ku ez agahdarbûm e, dibistan çêbûne, li wir min ji mendalekî kurd pirsî, tu ji kurî? Got: "Ez ji Sûrî me" Min jê re got nebêje ez ji Sûriyê me, bêje ez ji rojava me, min ew perwerde kir ku ew zanibe bêje, bakur, başûr, rojhilat, rojava, min jê re got ji bo te şekrokan bikrim ku tu zanibî bêjî, ew î got lê şaş çû û rojhilat ji bîr kir, min jê re got: Tu di ezmûneya xwe biser neketî, êdî min riwê wî maçî kir, û min jê re şekrok kirrîn, nabe ku zarokên me bê xwendin bimînin. Nimûne ew keçên ku min behsa wan kir beşê wan yê zangoyê evin: (Endeziyar, toreya Îngilîzî, zanista civakî) wesa bawernameyên wan bilindin.

**Hun ji tevgera siyasî ya rojavayê kurdistanê razîne ?**
Na..! Ez nerazî me..! Diya min Rewşen tim digot:" Eger hun yekîtiya kurdan bidin min, ez ê kurdistanek azad bidim we" Binêre.! Kurd pêşî pêwîste ku ew fêrî mirovatiyê bibin, êdî partiyan ava bikin, Vaye diyare Amrîka, Birîtaniya, Feransa, çend partî di welatên wan de hene, her kes dizane ku di wan dewletan de du-sê partiyên serke hene, em kurd û li rojava bi taybetî min bihîst ku 32 partî hene, babo min got gereke ez mîdaliyan ji wan re çêbikim..!
Hun dibînin ku peyama Celedet Bedirxan di rojava de hat xwendin..?
Erê, bi xurtî jî hat xwendin, asta wan bilind e, û zimanzan û ronakbîrin.

**Hun çawa li herçar parçeyên kurdistanê dinêrin?**
Kurdistan yek parçe ye, di dilê her kurdekî de ye, em hemû kurdin, kurdistanî ne.. Niha em li herêmek azadin, ji vir em destpêdikin, ez ala xwe dibînim ya ji hemiyan girngtir, me serokek heye, hikûmetek heye, dibînim ku ev herêma azad ji kurdistana mezin re wê bibe bingeh ji bo Kurdistan mezin .
Peyama we ji bo rojavayê Kurdistanê çiye?
Pêşî silavan li wan û berxwedana wan di şoreşa Sûriyê de dikim, dem hatiye, mezin bin birabin, zana bin, êdî nakokî bes in..

**Dayê, Sînemxan spas ji bo vê derfeta hêja…**

# Nivîsîn û zimanê zikmakî

Narîn Omer
narinomer76@gmail.com



Ji dehê salan ve axaftin û goftugo pir dibin li ser zimanê kû nivîserê kurd pê dinivîse û berhemên xwe pê diweşîne û belav dike.
Helbet ew axaftin ne wek hevdû têne diyarkirin, belê ciyawaziya wan zelal û eşkere tête xuyan. Lê em dikarin wan di du pêlan de bidin nasîn:
-Pêla yekem dibîne pêwîst li ser nivîserê kurd kû tenê bi zimanê dayikê binivîse û berheman çap bike û biweşîne da nasnameya zimanê xwe zelal û resen bihêle û biparêze, û ji aliyek dî ve dibêjin kû pirtûkxaneya zimanên dî têre û zengîne û nehewceyî nivîserê kurd e heta wê zengîntir û têrtir bike, lê belê em kurd bi hezarê pirtûkan ji me re divin da em pirtûkxaneya xwezengîn û bi sûde bikin.
-xwediyê pêla didwan dibînin ya baş ewe kû ziman nebe pirsgirêk û kelem di riya pênûsa nivîser de, çimkî ew dikare bi çi zimanî be xizmeta gelê xwe û civaka xwe bike, û gelek caran berhemên wergerandî nikarn daxwaz û omîdên nivîser bigihînin xwendevan weko wîb ive û ew dixwaze.
Bi rastî ez nivîskarê kurd nabînim gunehbar demaew bi zimanên dî dinivîsîne û berheman di weşîne, lê belê ew gunehkare dema tenê bi zimanê biyanî dinivîse û xwe fîrî zimanê xwe yê zikmakî û dayikî nake,ji ber kû ziman nasnameya mirov û gela ne, û em kurd weke miletek blindest zimanê me yê kurdî em parastine û heta niha jî me ji belavkirinê û wendabûnê di parêze.
Omêdarim kû nivîserên me li zimanê xwe vegerin û li ser tevna wî rewşa cinav û hasten kurdan bi rêsin.
Eger nivîskarê kurd rewşa gelêxwe bi zimanê biyanî diyar bike, û taybetmendiyagelêxwe û wêjeya kurdî bîneziman û zelal bike, xemnake, lê dema ew bi wî zimanî binivîse û xizmeta wî zimanî bi tenê bike, ew ji rêza nivîskarên kurd û ji ferhenga zimanê kurdî derdikeve.
Em kurdên başûrê piçûk (Weko nimûne) em bi erebî jî dinivîsin,Lê ez dikarim erê bikim û bibêjim kû dema nivîskarê kurd bi zimanê erebî divîsîne tenê bi tîpên erebî mijara wî tête weşandin, lê raman û coş û hasten wî bi kurdî û kurdewarî ne.
Ez herdem dibêjim:
xwezî ez fêrî hemî zimanê cîhanê bibim û yê hemî netew û miletan da êş û janên miletê xwe û doza gelê xwe bigihînim wan bi awayek rast û dirust, û wan bi çand û huner û zanistiya kurdî bidim nasîn û ji wan re şirove bikim.

www.arsivakurdi.org

# ÇIMA GIRÊDANA KONGIRA NETEWÎ DI VÊ DEMÊ DE?

**bêkesê rojava**

Eger em wek tevger û partiyên Kurd û Kurdistanê hindekî li xwe vegerin û li rewşa xwe xwedî derkevin û bimeyzînin, ka em Kurd di çi delav û qonaxê re derbas dibin, emê wê hîngê xweş nas bikin pêdvîû girîngiya girêdana kongira netewî ya Kurdistanê mebest jê çi ye û sûda wê li gor berjewendiyên netewî di çarçewa tevgera rizgarîxwaza Kurd deçi ye. ji ber vê yekê em berve çêkirin û avakirina gelek fîdralîzmên Kurdî li her peçakî Kurdistanê diçin. Di vî warî de bila em xweş zanibin azadbûna rojavayê Kurdistanê kilîla hemû serkeftinên Kurdaye di perçyên Kurdistanê. Di vî warî de ji îlham û pojinandina serok Barzanî li ser bingeheke stratîcî ew gelek dorkêş e li ser parastina netewa Kurd û Kurdistanê ji pêlanên qirêj yên dijmin. Lewre wî didît ew kongire heger bi ser keve ûbi serî bibe wê pir pirsgirêkên dijwar bînin ser holê û rola Kurda di rojhilata navîn de pir xort bibe û ciyê balkêşiyê be ji aliyê dewletên cîhanî de. Vêca di van rojên îroj de wek herêmên rojavayê Kurdistanê bi ber bayên êrişên ordiyên çekdar yên Îslamiyan ketine û têne talan û wêran kirin. Di vê çaxê de kongireke weha ji me Kurdan re bête girêdan gelek girîng e, lê nama serok Barzanî ya ku ji komîta amedekirina kongira netewîre bi rê kiriye wê jî hêzekî xort



da Kurda û bi dengekî bilind nîşan da komên çekdar û dewletên herêmê ku hîn gelê me yê Kurd li ser pê û lingên xwe ne û dikarin di bin sîû sîwaneke netewî de ûli ser bingeheke milî ji bo çareserkirina mafê gelê Kurd li seranserî Kurdistanêbigihên hev.

# Di bîranîna serjimara awerte de 22-8- 1962

**N-Beyro Dêrik**

Bê goman gelek pirojeyên regezperestî hatine cîbicîkirin derbarî kurdan li rojavayê kurdistanê, û destpêka van pirojeyan (yasaya serjimara awarte ) ya ku hate derhênan bi jimara 93 an rêkeftî 22-8 1962 an. Û bi taybetî li herêma cizîrê (hiziça) hate cîbicîkirin. Ev piroje ya desthilata sûrî ya nû bû ango piştî cudabûna navbera sûrî û misrê de û vê desthilatdarîyê dixwest diyarbike heta çi astî biregezperestîya erebî ve girêdaye û bide xweyanîkirin ku ji( Ebdil nasir ) nîzîktrî netewa erebî ye . çimkî wê çaxê kurd tawanbardikirin bi parçekirina sûrî û çêkirina dewleteke û binavê (israyêl a diwan) binavdikirin û belkî tiştê sereke yê ev desthilat hêrzkir vêxistina şoreşa eylola mezin 1961z , heweha damezrandina partî 1957z li sûriye ku bigiştî kurdan ew hembêzkir û hişyarî mafê rewa kirin û di ancamde rijêmê ev serjimara awarte di yek rojê de pêkanîn û nasnameya nêzkî 120 hezar xêzanên kurd ji wan kişandin û gotin ev kes penaberin û ne xelkê vî welatî ne tevlî ku jimareka mezin ji van kesan berî wî çaxî di sopayê sûrî de leşkerîkiribûn û ji encama vê fermanê jî gelek bav û kur ji hev cudabûn hin binasnama û hin bê nasname û wesa bira û bira jî û gehişte astê ku serok erkanê sûriyê ku wê demê kurd bû ( Tewfîq nîzame dîn ) xwe bê nasname dît , her weha hin ji binemala Ibrahîm paşayê milî ku beşdarî di damezrandina civaka perlemanê sûrîde kirine sala 1928z nasnameya wan hate kişandin . bi giştî kesên mane bê nasname binavê biyanîyên tirk rijêmê ew didan nasîn û bi şûn re navê wan bû biyanîyên sûrî û bi vê yekê bi hezara kurd bê mafê hevwelatîyê man û di bin du corande hatin dabeşkirin , yên rijêmê kerta sor dayê wan û yên bê xan mane ( mektom ) navê wan di pirtokê nivîsandinêde ne hatibû ji encamê hevjîniya navbera wan û yên biyanî de û beşkî din heye xwedanê rewşeka baştirin lê ew jî weke yên nasnameya wan hatî kişandin bê mafê hevwelatiyê ne . herweha li gurî raporta salane ya rewşa mafê mirovan li sûriyê a 2008an bihtir ji pêncî xêzanî ji van kesan li kobanê jî hene ….

serjimara awarte bû sedema serekî ji cîbicîkirina piropjeyên regsperestî yên bi şûnre hatî pêkanaîn derbarî kurdan ku merema rijêmê ji van pirojeyan ew bû kurdan hejarbike û wan bi nanê rojane mijobike da bi çi awayî bi mafê netewî raman nebin û bimînin penaber liser xaka xwe û rijêmê karî heta astekî vê armancê pêkbînê ku hişt bi hezaran kurd bibne meşextî û berê xwe bidne bîyanyê çi li hundirê sûriyê û çi ji derve û tevlî ku kurdan gelek qurbanî danîn dibin bandore van pirojeyn de li di dawiyê de karîne berevaniyê di ber hebona xwe de bikin û xwe li ber van pêlên zor bigirn û mane parastî ji wendabunê

Maye em bêjin ku tevlî xebata dirêja tevgera siyasî a kurd li rojavayê kurdistanê dijî vê pirojeyê, ne karî rijêmê neçar bike û çareseriyekê ji van kesên ku nasnameya wan hatî kişandin re bibîne . lê belê piştî vêxistina şoreşa miletê sûriyê ( adara 2011 ) rêjêmê bi hesanî nasnameya van kesan li wan vegerand di bin merema kurdan jê vê şoreşê dûrbike bê ku bide xweyanîkirin wê çawa buhayê nîzîk pêncî salî ji êş û xişm û peneberiyê vegerîne .û heger me got belkî di pêşerojêde werin bedelvegirin gelo hin hene karibin mafê wan kesên biyanî mirî li wan vegerîne ?



Derbederî



Hejarî

www.arsivakurdi.org

# Rola ciwanên kurd di pêkhatina civaka sivîl de

**Bilind mela–Dêrik**
E_bilind@nefel.com



Law pêşeng û pêşberê hemî miletanin û sitûn û binyatên civakê ne . Û hêzek mikum û çalak e , lewra giringatiya ciwanan tê ji hest û bîrên zelal yên ku ciwan radije , ji ber vê yekê pêdiviya bayexdanekî taybetî ji wan re bêt pêkanîn , û bi taybetî ji layê şarezariya wan di hemî war û mijaran de û şarezariya wan werê geşepêdan li jêr berhevkirin û peywendiyek dirust ta ku bigehên di astek bilind û berz de . Wek tê zanîn îro em di guhertinek mezinde ne û hişta berdewamiyê dike , û sîstema mirovayetiyê di pêvajoyeka serkeftî de dişope ji ber ku ev e armanca hemî mileta n e . Rola rêxistinên civaka sivîl ya binyat û sereke roniye û diyar e ji ber ku ev civak civakek serbixwe ye ji desthilatê tê pênasîn bi serbixwe ye û li jêr de her mirovek rola xwe diliyze , û kar ji bo xizmeta milet û hemî berjewendiyên giştî û berevanî di ber mafê mirovan û kesên lawaz.Perwerdeya ciwan di vê civakê de pêdivî ye ji valahiya îdyolociya ta ku karibe rola xwe di pêşketin û hişyarbûnê li wargeha civakî de û li vê hevçerxa nû de bilîze. Diktatoran bi çingalê hêza xwe miletê kurdan durpêçkiriye û çi pêşkeftinên di civakî de em bê par man e , lewra ji bo azadî û rizgariya me pêwîst e ku lawan serkêşî û semyanî be , û ji ber ku law regezek serekî ye di pêvajûyê de .



# JINA KURD

**Dijwar Tewfiq-Amûdê**




jinyarî

Dixwazim diyar bikim ku yek nîşana herî bilinttir di civata me Kurda; bi olî, bi çandî, bi ziman bi taybet berya dagir kirina Kurdîstan'ê de jina Kurd bûn. Peyva jina Kurd di civata xwe ya dîrokî de rêzdarîyêk berz dahatin pejirandin. Jin di nav civat û malbata xwe de mafdarê biryar dahîn bûn.

Jina Kurd wek Edla Xan serokatî ya Herêma Suleymanî ya karanît, Halîma xanim Herêma Çolemerg'ê karanît, Adela Xan, Halabja karanît. Jinên wek Meryem Xan û Fatma Xan jî cardin di dîroka jina Kurd de giringin ger bên ziman.

Jina Kurd, şerê dijî neyarên Kurdîstan de şervan wek birêz pakrewan Leyla Qasim, siyasetê de siyasetvan wek, Zakiyya Hakki, Widad Akrawi, Nasrin Barwari, Leyla Zana, li zevî yê de karker, mala xwe bermalî, bezîrganvanî yê de karmend wek Ferda Cemiloglu, perwerdê de mamoste wek Hapsa Xan, zanyarî yê de helsenger wek Asenath Barzani wêjenê de wêjenvan wek , hûner de hûnermend wek Tara Jaff, Aynur Dogan, Ayşe Şan û her şaxên jiyanê de weyna xwe lîstin û wanê ku li jiyanin berdewam dikin. Em jibîr nekin ku di Anfal'a 1988'da de jina Kurd di kampan de hatin tundî kirin. Şerê Yekema Cîhanê de hêzên artêşa Tirk û Rûs êrîşê Mahabad kirin 200 jina Kurd hat tundî kirin. Dîsa di serhildanên Bakur'ê Kurdîsta'de wek dizanin Serhildana Şêx Seîd'ê Pîran (1925) û Serhildana Seyîd Riza (1938) artêşa Tirk pêşî êrîşê jina Kurd kir, wan tundîyêk giran de derbas kir û koçber kir. Keçikên wenda yî rojeva me de yek bi yek derdikevin holê. Vê tehda yê zorbaz Seddam jî li jin û keçen Kurd kir. Jina Kurd gor tev zilm û tehdayên; civakî, malbatî û neyarên welatê xwe Kurdîstana rengîn de li ser lingê xwe yê û mora azadî yê li welatê xwe û rojhelata navîn dixe. Ji ber vê em wek partîyêk demokrat ger tehda cotsandardî yê li ser jina Kurd rakin, nasnama wê ya dîrokî xelatê wî bikin. Maf û ciyê jina Kurd bilinde. Em wan bidin ser serê xwe ewê welatê me, aborî ya me, zanyarî ya me her şaxên jiyana netewî û navnetewî de pêşxin. Jin perçak herî girîngtira jiyanê ye û ji bo bilind kirina wespa jiyanê em jina Kurd bilind kin. lê rojeva me de Jina Kurd îro nava rewşek xerab de ye. Ev bi gelemperî nikarê bê gotin, lê nava pirsgirêka civakî de ciyê xwe digre. Em her roj nûçeyên kuştina jina Kurd dibîzin. Kuştin bi deste malbata wan li ser navê namûsê tê kirin. Ev şermezarî dikeve ser milê me me tev mêr û civata Kurd. Ji derva yî welat û şaxên navnetewî de wêne ya Kurd wek hovî nîşan dide. Ez wek xortek şarezar û demokrat vê napejirînim û dixwazim ev yeke ji nav civata min a Kurd derkeve.



# Nanî bidin dest nanpêjan

**Helebça Sadûn - Dêrik**

Di destpêka şoreşa Sûriyê de hin partiyên siyasî li Rojavayê Kurdistanê ji qûnaxa bê re xwe amade kirin ,destpêkirin bi riya firekirina bingeha xwe ya cemawerî û gelêrî, û ber bi karê dezgayetî ve çûn , heta ku berhev û amade bin ji rêveberiya dema bê re û karên hevbeş dane pêşiya xwe û siyasetên xwe li gorî wê yekê avakirin . Lê hin aliyên dî hewldan ku rêveberiyekî çêkin û feriz bikin li ser gelê xwe bê şirîkatiya partiyên dî yên bira , tevî ku hevkarî bi hin aliyan re kirin ji rikberiya Sûriyê yên ku dijî kêşa kurdî kar dikin . vê tiştê hişte ku gumanin bi mirov re peyda bibin,ku eger ew alî bimînin li ser vê siyaseta xwe ,wê ev derfeta zêrîn ji dest kurdan derkeve, ji ber ku ew bi vê ez-ezîtiyê wê bihêlin pirojeyê rojavayê kurdistanê bibe qurbana nêrînên wan yên yekalî , û evê tiştê hêla ku îro tirs û ne aramî di nav civaka kurdî de rû bide û civaka kurdî lihevda û hejand û bû egerê serekî hişt ku kurd ber bi bazdan û koçberiyê ve herin . Di gumana min de divê em kurd sûdmendiyê ji serpêhatên rêjîmên dîktatorî yên ku niha hin ji wana hatin dadgehkirin û hin dî li ber dergehê dadgehên navxweyî û navdewletî ne û divê em sûdmendiyê ji ezmûnên dewletên pêşketî jî bigirin ,ew dewletên ku xwe bi beşdarbûn û hevbeşiya hemû aliyan di rêveberiya dewlata xwe de û niha em vê tiştê berçav dibînin, ku serketî tê bikaranîn li Herêma kurdistanê. ji ber divê her kes bigihê wê baweriyê ku dema kurdên rojava rabûn û bi azadî û hilweşandina rijîmê bankirin, ne ji ber rêjîma dektator ra be û di cihê wê de rêjîmeke dî ya dektatorî bi navek dîtir we re deynan û avakirin .Di baweriya min de dem hatiye û divê em nanî bidin dest nanpêjan, ji ber kurd hişyartirin ku bikevin di bin bandora van fişar û birhan de .



nanpêjî

www.arsivakurdi.org